

Danasîneka Li Ser Metoda Vejandina Zimanan¹

An Overview of The Method of Language Revitalization

Zana ŞAYBAK

Zana ŞAYBAK | <https://orcid.org/0000-0001-7232-2760> | zanasaybak65@gmail.com
PhD. Candidate at Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye,
Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye

ROR ID: <https://ror.org/0396cd675>

Citation:

Şaybak, Z. (2025). Danasîneka Li Ser Metoda Vejandina Zimanan. *Nubihar Akademi* 24, 1-21.
DOI: 10.55253/nubihar.2025.1646566

Submission Date	25.02.2025
Acceptance Date	06.10.2025
Publication Date	31.12.2025
Article Type	Research Article
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes - İntihal.net
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare. For any complaints: nubiharakademi@gmail.com
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0 .
Indexing	EBSCO, DOAJ, ERIH PLUS, Ulrich's Periodicals Directory, Linguistic Bibliography, MLA
AI Policy	The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.

1 Ev xebat ji teza lîsansa bilind a bi navê “Metoda Vejandina Zimanan: Mînaka Kovara Hawarê” hatiye dariştin. / This paper has ben derived from master’s thesis of the author entitled “The method of language revitalization: Example of Hawar Journal”.

Puxte

Ji bo zimanên ku di bin xetereyê de ne ji aliyê hin zimannas, lêkolîner û sazîyan ve, metodeka vejandina zimanan hatîye avakirin. Problema vê xebatê ew e ku ev metod pir nasyar nîne û hewcehî bi danasîna wê heye ku ji bo zimanên di bin xetereyê de ne bibe rêbereke. Ji ber vê hewcehî bi xebateka wiha hatîye dîtin. Armanca sereke ya vê xebatê danasîna bihurgilî ya metoda vejandina zimanan û binbeşên wî ye. Ev metod çî ye, ji bo çî ye, motîvasyon, îdeolojî helwest û plandsazîyên wê çî ne? Wekî sedema hebûna metoda vejandina zimanan, mirina zimanan çî ye? astên wê çî ne? Ev xebat bersiva van pirsan dide. Metoda vê xebatê veguheştin e, xebateka lîteratûrê ye. Di encama vê xebatê de tê dîtin ku vejandina zimanan wekî pêvajoyeke civakî û çandî tê dîtin, ku ji bo parastina nasnameya etnîkî û mîrata zimanî girîng e. Ev metod dixwaze hişmendîyêke nû ya zimên belav bike ku ji bo domdarîya zimên bikêr e. Zêdebarîya ku ev metod li vê qadê dike ew e ku wekî metod behsa vejandina zimanan tê kirin ku herkes dikare bipejirîne û li gorî xwe pêk bîne. Dide zanîn ku vejandina zimanan tenê ji bo vejandina zimên nîne heman demê ji bo parastina çand û nasnameya civakê jî girîng e. Çareserîyên pêşvebirina zimanan tên bidestxistin. Kesên ku yan jî sazî, komele wd. ên ku dixwazin ji bo zimanê xwe zêdebarîyêke bikin dikarin ji metodê sûd werbigirin ku gav bi gav nişan dide.

Peyvên Sereke

Vejandina zimanan, plansazî, çareserî, pêvajoyê, parastin.

Abstract

For languages that are endangered, a method of language revitalization has been developed by some linguists, researchers, and organizations. The problem this study addresses is that this method is not widely known and needs to be understood so that it can serve as a guide for endangered languages. Due to this need, a study like this was considered necessary. The main aim of this study is to provide a detailed understanding of the method of language revitalization and its components. What is this method? What is it for? What are its motivations, ideologies, approaches, and planning strategies? What are the causes of language death that led to the need for revitalization? What are its dimensions? This study seeks to answer these questions. The method of this research is qualitative; it is a literature-based study. The findings show that language revitalization is seen as a socio-cultural process that is essential for preserving ethnic identity and linguistic heritage. This method aims to promote a new awareness of languages, making them usable for language continuity. One of the strengths of this method is that it presents language revitalization as a flexible model that anyone can adopt and adapt to their own context. It is understood that language revitalization is not only about reviving languages but also about preserving the culture and identity of the society. Solutions for promoting endangered languages can be achieved. Individuals, institutions, organizations, etc., who want to strengthen their language can benefit from this method, which provides a step-by-step guide.

Keywords

Language revitalization, planning, process, solutions, preservation.

Destpêk

Ziman wekî hêmaneke bingehîn a mirovahiyê dareke çiqlên wê zêde ye, her çiqlê wê xwe digihîne qadeke din û li wê derê bingeha xwe ava dike. Yek ji pênaseyên zimên a Unescoyê ev e, ziman rêya mirovan ya xwegihandina nav bîra kolektîf û nirxên wan e. Hêmaneka bingehîn a nasnameyê û hîmekî bingehîn ê cûrbecûrbûna mirovan û mîrateya wan a zindî ye. Lê îro ji 6.000 zimanên ku tîna axaftinê qasê nivê wan di bin xetereya windabûnê de ye û ev pêvajoyên mîsoger û jêveger e (2010, r. 4).

Têgeha vejandina zimên tê maneya ji nû ve vejandina zimanekî, ev ziman dibe ku bibe zimanekî ber bi windabûnê yan jî zimanekî ku di bin xetereyê de ye. Vejandina zimên ne tenê ji bo ku sîstema zimên a şerxwaz a zimanekî kêmepar berfireh bike, heman demê ji bo ku ziman di qadên nû de digel axiverên nû bikaranînen nû pêk bîne hewildanan nîşan dide. Ji bo vejandina zimanan wekî rêbertiya vê yekê bike armanc, sedem, plansazî, motîvasyon, îdeolojî û helwest hatine nîşandan. Ev wekî pêvajoya vejandina zimanan, metoda vejandina zimanan yan jî rê û rêbazên vejandina zimanan tê binavkirin. Ji bo vê xebatê û xebatên dîtir yê derbarê vê mijarê têgeha metoda vejandina zimanan hat hilbijartin.

Metoda vejandina zimanan bi navê xwe wekî vejandina zimanekî ku mirî ye tê famkirin lê divê bê zanîn ku ev metod ji bo zimanên ku di bin xetereyê de ne û zimanên ku rewşa wan stabîl e û di heman demê de zimanên ku çend axiverên wî mane dikare bibe rêyeke xilasîyê. Ev metod ji bo her zimanekî ku di rewşeke cuda de ye çareseriyên cuda cuda nîşan dide. Hinton radigihîne ku faktorên ku bandorê li ser peyda bûna vê metodê kirine gelek in, lê yê ku zehftir bibandor in dikarin wekî faktorên polîtîk û guherînen cîhanî bîn nîşandan. Wekî berteka li hemberî dîroka bindestî û asîmîlasyona bi zorê, vejandina zimên ji aliyê axiverên zimên wekî rêya başbûn, dadperwerî û hêzdariyê tê dîtin. Bi vî awayî vejandina zimên bi giştî beşeka vejîneka etnîkî ya berfireh e. Bûye tevgereka cîhanî û bi keda mirovan ve girêdayî ye. Ew ji bo berjewendiya bi hezaran zimanên ku li ber mirinê ne yan jî di bin xetereyê de ne dixebite (2018, XXII).

Vejandina zimên derbarê vegera hesta nasname û aîdiyeta li cîhanê ye (Hinton ûyd., 2018, r. 3). Ji ber ku ziman nîşaneya hebûna miletan e, millet bi zimanê xwe aîdiyeta xwe li cîhanê pêk tînin. Sedemeka din a hewcehiya ji bo vejandina zimanan komkujî ye. Çend pênaseyên komkujîyê: Kuştina endamên civakê; Zerardayîneka cidî ya laşî yan jî derûnîyê li ser endamên civakê; Bi zanetî bibandorbûna li ser şert û mercên jîyanê ya civakê, tunekirina temamî yan jî qismî ya fizîkî; Sepandina tedbîrên ji bo pêşgirtina jidayikbûnê di nav civakê de; Bi zorê veguheştina zarokên civakê bo civakeka din. (Skutnabb-Kangas, 2018, r. 14-15). Pênaseyên yekem û pêncem wekî komkujîya zimanî, perwerdeyî, sosyolojîk û derûnî tîna dîtîna Bi vî awayî her awayê komkujîyê digel tunekirinên xwe zimanan jî tune dikin yan jî wan dixin bin xetereyê. Digel mirin an jî xeterbûna zimanekî hemû çand û zanyarî û gelek tiştên din jî yê ku bi zimên ve girêdayî ne dimirin. Loma wekî ku Hinton dîyar dike vejandina zimên

problemeka mafên mirovan e. Ji ber van sedemên bingeîn bi awayekî xwezayî hewcehî bi vejandina zimên çêdibe, ji ber ku her mirov xwediyê hesta nasname û aîdiyeta li cihanê ye û tûnebûn yan jî wendabûna wan ji bo mirovan xeter e. Sedemeka din a girîng ji bo vejandina zimanê xwe yê mîrat ew e ku dixwazin xwe bigihînin pratîkên çandî, kevneşopî û nîrxên kevneşopî. Gelek caran tê gotin ku ziman mifteya dilê çandê ye (2013, r. 3-5). Ev sedem li ser tîkiliya domdar a ziman û çandê ye. Ev jî girêdana zimên a bi çandê nîşan dide ku pêşveçûn û paşvemayîna wan girêdayî hev e. Lewra vejandina zimên heman demê tê maneya vejandina çandê.

1. Metoda Vejandina Zimanan

1.1. Armancên Metoda Vejandina Zimên

Fikrên ser armanca vê metodê cuda cuda ne û gelek in. Lêbelê gelemperî wextê behsa vejandina zimên tê kirin armanca bingeîn ew e ku ziman cardin di nav civakê de ji aliyê kal û pîran heta ciwanan ve were axaftin. Digel vê yekê gelek sedemên dîtir jî hene dîsa mirov dikare bi du kategoriyên sereke bi awayekî giştî diyar bike. Ev du kategorî; sedemên pragmatîk û sedemên îdeolojîk in. Wekî mînak, hewildan ji bo zimanekî tînan dayîn ku ew ziman ji aliyê aborî, hêz, pratîk, kontrol yan jî ji ber hin sedemên dînî, çandî, neteweperestî dibe armancên vejandina wî zimanî (Spolsky, 1996, r. 7-8). Di metoda vejandina zimên de armanc li gor daxwaz, hewcehî û îdeolojiyan teşe digire. Her kom û ferdên ku ji bo vejandina zimanan dixebitin dikarin li gor xwe armancên vejandina zimên diyar bikin. Metoda vejandina zimên ji bo diyarkirina armancên vejandinê çend pirsan pêşnîyaz dike. Çima vejandina wî zimanî tê xwestin? Gelo daxwaz ew e ku bergeha zimên bê firehkirin? Ji bo ku di mekteban de bê axaftin yan jî ji bo ku li ser teknolojiya nû bê axaftin? Dibe ku ev hewcedariyê bi termînolojiyên nû çêbike; nexwe di kîjan rewşê de dê kî û çawa bikare vê biryarê bide? Gelo divê ji bo nîfşa nû 'yan jî yên di navbera nîfşa nû û ya berê de mane, em zimanê kevneşopî vegeînin yan jî divê em zimanê xwe ji nû ve îcad bikin? Eger zimanê me cihêreng be divê em yekî hilbijêrin û li ser wê bixebitin? Divê em hewl bidin zimanekî standard biafirînin yan jî bi tevahî piştgirî bidin cihêrengiya zimên? Pirsên bi vî awayî zehftir bi tîkoşînên politîk û nîqaşên îdeolojîk; bi xwedîbûn an jî rastbûnên tîkildarî zimên ve girêdayî ne. Eger zimanek pir di xetereyê de be, dibe ku tenê kêman caran û bi awayekî parçebûyî tê bikaranîn ji ber hindê dibe ku hewcehî pê hebe ku ji nû ve were avakirin (Sallabank, King, 2021, r. 33-34). Bi bersivandina van pirsan armancên vejandina zimên bi awayekî sistematîk û rast tînan diyarkirin. Ji ber ku ev pirs li ser diyarkirina rewşa zimên û hewcehiyên zimên radiwestin. Li gor rewşa zimên pirsên dîtir jî dikarin li ser van pirsan bînan zêdekirin.

1.2. Motîvasyonên Metoda Vejandina Zimanan

Motîvasyonên vejandina zimanan piştgirîya sedem û armancên vejandina zimanan dikin. Loma motîvasyonên vê metodê bi armanc û sedemên hewcehiya vejandina zimanan ve girêdayî ne. Armanca nîşandayîna motîvasyonan di qanîhkirina

vejandina zimanan de rol dilfzin. Ev motîvasyon, motîvasyona vejîneran zêde dikin. Wekî ku Grenoble jî amaje pê dike, vejandin pêvajoyeka dînamîk û herikbar e. Divê neyê jibîrkin ku vejandin tenê di derbarê zimên de nîne, di heman demê de ew tevgera civakî ye ku bi kêrî civak û takekesan tê. Ji bo vejandina zimên motîvasyonên cûrbicûr hene, divê ew jî li ber çavan werin girtin (2021, r. 9).

Her kom yan jî ferdên ku serî li vê metodê didin, xwediyê van motîvasyonan û heman demê li gor rewş û daxwazên xwe dikarin motîvasyonên nû jî bidin ber xwe. Hin motîvasyonên sereke bi vî awayî ne; çand, kevneşopî, saxbûn, başbûn, tendirûstî. Vejandina zimên gelemperî di vejandina çandê û vejandina kevneşopiyên çandî de wekî gava ewil e. Motîvasyona vejandina zimanekî dibe ku bibe manewî, wekî; vejandina zimên ji bo axaftina bi xweda, rih û hebûnên derasayî. Bo nimûne, li Sîbîryayê mirovên xwecih piranî xirîstiyên in lê gelek komên ku hêj şaman in jî hene. Ev kom îbadetên xwe bi zimanê xwe yê zikmakî pêk tînin û diyar dikin ku ji bo îbadetê zanîna zimanê xwe mecbûrî ye. Bi vejandina zimên pêwendîyek bi yên pêşiyên xwe re çêdibe (Grenoble, 2021, r. 12). Ev motîvasyon nîşan dide ku ziman heman demê çand û kevneşopî ye û ew girêdayî hev in. Bi başbûna zimên bi gotineke din bi vejandina zimên heman demê çand û kevneşopiya wî miletî jî jîndar dibe. Loma pêkan e ku di xebatên ser giringiya zimên de mirov rastî li vê motîvasyonê were.

Bi vejandina zimên saxbûn pêk tê. Gelek mirovên xwecih saxbûnê weke sedemeka sereke ya vejandina zimên dibînin. Ew gelemperî wisa hîs dikin ku zimanê wan, mafê takekesî û hîlbijartina qedera wan bi zorê ji wan hatine veqetandin. Bi vejandina zimên jî ev tiştên ku ji wan hatine veqetandin ji nû ve tînin bidestxistin. Vejandina zimanan parçeyê mezîna a pêvajoya dijkolonyalîzmê, vejandina çandî û jinûvestandina mafê hîlbijartina qedera mirovan e. Kesên ku zimanên wan ji ber kolonyalîzm û hwd. ji wan dûr hatine xistin û ketine bin xetereyê gelemperî xwediyê hin tecrûbeyên hevpar in, wekî tramwayên zimên. Lewra vejandina zimanan ji bo saxkirin û jîholêrakirina van tramva û tecrûbeyên xirab giring e (Grenoble, 2021, r. 14). Ev motîvasyon ji aliyê hin zimnasên kurd jî hatîye destnîşankirin, wekî ku Celadet Bedixan zimên û hebûnê bi hev du girê dide û dixwaze vê helwestê ji bo parastina kurdî li kurdan zêde bike û vê yekê wekî xilasîyê dibîne.

Tecrûbeyên hevpar yên miletên kêmpar wan digihijîne daxwaz û xebatên nêzî hev. Yek ji wan jî parastina zimên e. Ji ber hindê çawa li netewe dewletan polîtîkayên parastina zimanên wan hene, tê zanîn ku di nav piraniya miletên kêmpar de jî hişmendîya parastina zimên heye û ev ji ber tecrûbeyên hevpar pêk tê. Motîvasyoneke din jî tendûristî ye, lêkolîn diyar dikin ku feydeyên tendûristiya derûnî û laşî girêdayî axaftina zimanê mîrat e ku hesta nasnameyê xurt dike. Li gorî Grenoble, saxbûna ji vejîne ji trawmaya taybet a zimên derbas dibe, yanê bi vejandina zimên saxbûna ku pêk tê, tê maneya xilasbûna ji trawmaya taybet ya zimên; ew amûreke giring ya avakirina berxwedanê ye. Bikaranîna zimanekî dikare bibe wateya vegerandin û vegerandina kontrola çarenûsa xwe; ew dikare li hember kolonyalîzmê bibe çalaki-

yeka berxwedana siyasî, berxwedana li dijî asîmîlasyona ziman û çandî. Başbûna bi ziman li ser axiverên wî zimanî bi awayekî takekesî pêk tê. Hinek hestên wekî xwe- piçûkdîtin, jixwenebawerbûn li ba kesên ku zimanê wan ê zikmakî hatiye bişaftin tê dîtin. Loma wextê kesayetê xwediyê van hestan e cardin xwe bigihîne zimanê xwe û di nav civata xwe de cih bigire, başbûnek li wê kesayetê pêk tê. Vejandina zimên mirovan tîne ba hevdu û tîkiliyên civakî yên nêz saz dike. Wekî bernameyên ku ji bo vejandina zimên tîne pêkanîn, hin rojên pîrozkirinê (wekî roja zimanê dayikê, roja cil û bergên çandî û hwd.) (2021, r. 15).

Ji bo armançeka diyar civîna kom û mirovan li ser wan ji aliyê başbûnê ve bandorên erênî çêdike û ev bandor li ser çand û mîrata wan jî pêk tê. Ji ber vê yekê wextê komên ku xwe gihandine zimanê xwe û komên ku xwe negihandine werin berawird- kirin, tê dîtin ku li kesên zimanê xwe diaxivin tendûrîstiya derûnî baştir, rêjeya xwe- kuştinê kêmtir û îstîsmara madeyên xirab di rêjeyekê kêmtir de ye. Wekî din delîl hene ku xwegihandina ji zimanê xwe re, zimanê kal û bavan re tendûrîstiya laşî çêtir dike. Di warê diyabet, hîpertansiyon, kêmbûna çapa xwînê û nexweşiyên dilveskuler kêmtir dike. Ev feyde bi hin tiştan ve girêdayî ne, wekî; jiyîna jiyaneke kevneşopî, bêtir çal- lakbûna bi ax û jiyana kevneşopî re û hwd. (Grenoble, 2021, r. 18). Bi vî awayî tê fêh- mkirin ku başbûna ji aliyê tendûrîstiyê bi zimên jî pêkan e. Kesên ku cardin zimanê xwe aktîf bi kar tînin yan jî ji nû ve hîn dibin vegerekê jî pêk tînin, vegereka ji xwe re. Wekî mînak mirov dikare kesên ku ji gundê xwe hatine derêxistin û berê wan ber bi zimanek û cihekê xerîb e bifikire. Bi çend mînakên ev motîvasyon giringiya xwe dide famkirin. Xebatên ku li Kanada û Awistralya bi guhdayîna faktorên awayê jiyane hatine pêkanîn, nîşan didin ku aktîfbûna bi zimên di asta takekesî û ya civakî de hem başbûna laşî û hem jî ya derûnî pêşve dibe. Ev xebat ji bo motîvasyona vejandina zimên tiştekî bihêz e. Li gelek cihên dinyayê mirov behsa ‘vegereka ji bo’ zimanê xwe dikin. Ev pêvajoyeka aktîf e ku tê de kontrola jiyana wan û kontrola başbûna wan cih digire (Grenoble, 2021, r. 18). Dîsa lêkolîneka ku di sala 2012an de ji aliyê Unescoyê ve hatiye kirin diyar dike ku zarokên perwerdeya zimanê zikmakî distînin ji aliyê başbûna giştî pêşveçûn nîşan didin, xwebaweriya wan zêdetir, encamên azmûnên wan baştir, rêjeya devjêberdena dibistanê kêmtir û îhtîmala dubarekirina astên di- bistanê kêmtir e (Grenoble, 2021, r. 19). Ji van motîvasyonên vejandina zimên mirov digihîje sedemên vejandina zimên û feydeyên di dawiyê de. Li gorî metoda vejandina zimanan diyarkirina motîvasyona gaweke sereke yê vejandina zimên e.

1.3. Îdeolojî û Helwestên Metoda Vejandina Zimên

Her ziman li gorî şert û mercên ku di nav de ye di astek cuda de ye, wextê hin ziman ji aliyê plansaziyê ve di asteka baş de ne û tîra her qadê dikin ji bo bikaranînê hin zimanên din dibe ku di astên cuda yên xetereyê de bin. Ev rewşa zimanan li ser helwestên civakê yên ji bo ziman dîyardeyek e. Heke mirov li ser helwesta ziman ya ji bo zimanekî zêdepar û kêmpar mînak bide Zafer Açar li ser helwesta ziman radigihîne ku

Di gelek civakan de bala insanen piranî li ser zimanên fermî, bi prestij û berbelav e. Li gorî grûpên civakî û asta wan a perwerdeyê ev beralî mimkûn e ku ciyawaz be. Bo nimûne di nav grûpên nexwendî yên civakên kêmeper de, zimanê zêdeparan bi prestij dixwiyê ne tene ji ber îhtîyacên wan ên ku wan bêgav dihêlin ew hîn bin, lê ew wisa hizir dikin ku zimanê zêdeparan kubartir, nerm û naziktir e herwiha ew zimanê zanîn û pêşketinê ye. Li alîyekî din, di nav xwendekaran de jî zimanê zanîn û pêşketinê yan jî yê mode kîjan be ew zêdetir berê xwe didine wî zimanî. (2022, r. 164)

Wekî tê dîtin prestij û statûya zimên helwesta zimên dîyar dike, mirov wekî zindiyên berjewendperest berê xwe didin zimanê ku bi dîtina wan zehftir kêra wan tê û wan digihîne asteka jortir. Helbet ev helwest çavkanîya xwe ji polîtîkayên li hemberê zimanê kêmeper digire ji ber ku aramanca sereke ya wan polîtîkayan jixwe biçûkdîtina zimanê kêmeper û mezinkirina zimanê zêdepar e.

Di vê metodê de piştî diyakirina motîvasyonan hewcehî bi dîyarkirina îdeolojî û helwestan çêdibe. Cara ewil divê helwesta daxwaza vejandina zimên li ba vejîneran hebe. Paşê jî her vejîner divê guh bide helwest û fikrên cuda yên li ser zimanê wan ê di bin xetereyê de. Paşê jî divê biryar bê dayîn ka kîjan helwest di nav xwe de kîjan îdeolojiyan dihewîne û ji bo vejandina zimanê wan kîjan helwest û îdolojî dê bi kêr bibin. Divê helwestên zimanê zêdepar li ber çavan bînin girtin. Ji ber ku ew bandorê li ser zimanê kêmeper dikin û zimanê zêdepar dikare piştgirî bide zimanê kêmeper ku were xebirdan (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 104).

Di diyakirina îdeolojî û helwestên ziman de dîsa rewşa zimên, armancên vejandinê û motîvasyonên vejandinê bîngêhîn in. Lewra metoda vejandina zimên wekî sîstemeke serbixwe ye, gavên ku tînin avêtin bandorê li ser gavên din dikin û di dawiyê de encama ku tê gihîştin dîsa li gor gavên ku rast hatine avêtin teşe digire.

Îdeolojiyên zimên; bawerî, hest û ramanên di derbarê zimên de ne ku di warê civakî de tînin parvekirin û hewil didin ku formên cuda yên zimên (zaravayên li gor zimanekî standard, li gor zimanên zêdepar zimanên kêmeper, li gor cure axaftina temenmezinan axaftina ciwanan û hwd.) di nav civakê de bi cih bikin (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 105). Îdeolojiya zimên ya herî berbelav îdeolojiya zimên ya standardkirinê ye ku di gelek civatan de mirov dikare bibîne (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 105). Ev îdeolojî wê baweriyê nîşan dide ku formeka taybet ya zimên, gelemperî cureya ku di nav civakê de ji aliyê koma herî bihêz ve tê axaftin li gor cureyên din ên zimên zêdepar e. Cureya standard a zimên gelemperî bi formên nivîsandinê bibîngêh e ku paşê bi awayekî hatine lihevanîn û piştî gelek salên perwerdeya fermî hatine bidestxistin (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 106). Îdeolojiya standardîzasyonê li hember polîtîkayên yekzimanîyê ji aliyê civatên kêmeper ji bo parastina zimên tê pejirandin. Standardîzasyonê zimên heman demê girêdayî polîtîka û plansaziyên zimên e. Lewra ji aliyê polîtîkayên zimên, mafên zimên û mafên takekesî û hwd. Standardîzasyon tena serê xwe qadeka berfireh e ji ber wê di nav vê xebatê de bi awayekî berfireh cih nagire. Îdeolojiyeke din îdeolojiya

orjînalîtîyê ye. Ev îdeolojî têtîkîliya bi civateke taybet re nirxa zimanekî di nav xwe de dihewîne. Tiştê ku orjînal e wekî vegotina heqîqî yan jî xweseriyêke bîngêhîn a wê civatê nîşan dide. Di nav mantiqa orjînalîtîyê de cureyên axaftinê divê xwediyê nirxên kûr yê civat û herêma erdnîgariya xwe bibin (Woolard, 2005, r. 2). Li gor orjînalîtîyê ji diyalektên zimanekî ya ku tê hilbijartin divê zimanekî ji aliyê civatê cihê xwe baş girtibe û taybetiyên civata xwe nîşan bide. Kom yan jî ferdên ku ji bo vejandina zimanekî dixebitin li gorî gavên vê metodê dikarin îdeolojiya standardîzasyonê û îdeolojiya orjînalîtîyê bipejirînin. Helwestên zimên nêrîn, raman û pêşdaraziyên li hember zimanek an jî cur bi cur zimanan e. Helwestên zimên bi du aliyên civakê ve girêdayî ne: statu û hevgerîtin. Statu hem taybetiyên takekesî yê axiver (wekî mînak, eger axiver perwerde dîtibe û zana be) hem jî yê zimên (eger zimanekî spesîfîk nîne lê zaraveyekî zimanekî din be) nîşan didin. Hevgerîtin derbarê ziman û curbicuriya wê ya ku girêdayî civakê ye nîşan dide. Pîvana girêdana zimanekî yan jî diyalektê ya bi komek axiver yan jî ya bi civatê re nîşan dide (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 109). Wekî mînak, zimanekî ku forma wî ya nivîsandinê tune ye ji aliyê hinek kesan ve wekî zimanekî rastî nayê dîtin. Dibe ku hinek kes vî zimanî wekî devokeke bêperwerde bi nav bikin. Wextê hinek kes zimanê xwe di nav civatê de bi kar bînin şerm dikin yan jî wextê hinek kes zimanekî kêmpar diaxivin axiverên zimanê zêdepar xwe wekî di bin êrîşê de ne hîs dikin. Berevajiyê vê hinek mirov dikarin bi bikaranîna zimanê xwe şanaz bibin û zimanê xwe wekî zimanê xweştirîn bibînin. Wekî mînak, zimanê baskî. Axiver ji bo balê bikişînin ser bêhempabûna baskî, zimanê xwe wekî kevintirîn ziman nîşan didin û vê ji bo ewlehiya pêşeroja zimanê xwe dikin. Ji bo ku helwestên li hember zimanê wan bibin helwestên erênî vê yekê dikin.

Helwestên zimên teqez nînin, guherbar in. Dibe ku helwest û îdeolojiyên neyînî li ser zimanê ku vejandina wî tê xwestin hebin, di wê rewşê de guherandina rewşa zimên zehmet e. Divê helwestên civakê yê li hember zimên bîn zanîn û gavên plan-sazî, bername û xebatên vejandin û guherandinê li gor wan bîn avêtin (Dolowy- Rybinska, Hornsby, 2021, r. 110). Li hember helwestên neyînî pratîkên erênî helwesteke metoda vejandina zimanan e. Di guherandina helwestên neyînî de wekî pratîkên erênî çand roleke mezin dilîze. Bi pratîkên çandî qanîhkirina ji bo vejandina zimên û guherandina helwestên neyînî yê li hember wî zimanî hêsan dibe. Wekî mînak zimanê *wymysorys*. Du navên di yê vî zimanê *vilamovian* û *wilamowicean* e. *Wilamovice* bajarekê li başûrê Polonyayê ye. Heta hêzên komûnist ên ewil (1945-1956) werin vî bajarî zimanê bîngêhîn ê vî bajarî *wymysorys* bû. Niha zimanê *wymysorys* li vî bajarî jî aliyê qasî 70 axiverên xwecihî ve tê axaftin. Piraniya wan ji kal û pîran pêk tê. Li gor Unescoyê zimanê *wymysorys* di bin xetereyê de ye. Wextê ji bo vejandina zimanê *wymysorysî* xebat dest pê dikin, helwestên ku ji koma vejîner re têtin gotin bi vî awayî ne. Nîşî ciwan li hember vî zimanî di vê fikirê de bû, *wymysorys* zimanekî - pratîk nîne lewra hewce nake em hîn bin. Nîşî navîn çanda *wymysorysî* wekî çandêke bêmantîq û ne hêja didîtin. Nîşî temen mezin ku ji ber siûda xwe herî zehf ew êşiyabûn û qedexeyên li ser *wymysorysê* ji bîr nekirine ji ber tirsê ku

cardin zextên ser zimanê wan vegerin nexwestin *wymysorysê* bivejînin û bi kar bînin. Digel van helwestên li hember zimanê *wymysorysî* wextê xebatên vejandina zimên di sala 2014an de dest pê kiriye, yekem civîna vejandina zimên bi danasîna ziman û çanda *wymysorysê* dest pê kiriye û aktîvîteyên çandî yên wekî şano, dans û stranên folklorik hatine pêşkeşkirin. Bi saya xebatên bi vî awayî zimanê *wymysorysê* ji aliyê van nifşan wekî zimanekî ku bê kêr e hewcehî bi zanîna wî tune ye nehatiye dîtin û êdî li hember pîrzimaniyê hişmendiyeke wan a cuda çêbûye. Ziman ji aliyê nifşa ciwan ve hatiye hezkirin û ji aliyê nifşa temenmezin bûye cihê şaşmayîne. Fam kirine ku zimanê wan di bin qedexeyên berê de nîne, ser de jî tê parastin. Helwesta wan a li hember zimanê *wymysorysê* guheriye (Majerska-Sznajder, 2021, r. 27-28). Bi vî awayî bi helwestên metoda vejandina zimanan mimkûn e ku bi pratîkên erênî helwestên neyînî bèn guherandin. Lêbelê wekî tê dîtin hewce ye pratîkên erênî li gor kodên civatê bèn hilbijartin.

2. Mirina Zimanan

Li ser mirina zimanan gelek xebatên cûrbicûr hene. Yek ji wan xebatan xebateka Davîd Crytsal ya bi navê “Language Death” heye. Bi awayekî berfireh, behsa vê mijarê dike. David Crystal pênaseya mirina zimanan wiha dike: Heke kesek tenê jî bi herikbarî bi zimanekî biaxive, ew ziman dijî, lê heke ew kes bimire û tu kesên bi wî zimanî biaxivin nemîne, wê gavê ziman dimire (2003, r. 1). Li gor Unescoyê jî wextê zimanek ber bi mirinê ve diçe û dikeve bin xetereyê û eger di dest de çavkaniyên hêja yên dokumantasyonê tune bin, ew ziman ti caran nikare ji mirinê were xilaskirin. Wextê zimanek di bin xetereyê de be, axiverên wî zimanî êdî wî zimanî bi kar naynin û qadên bikaranîna wî kêr dikin û veguhastina navbera nifşan de pêk naynin. Bi vî awayî axiverên nû yên ciwan yan jî zarok yên wî zimanê çênabin (2003, r. 2). Wekî ji van pênaseyan jî tê famkirin mirina zimanan pêvajoyeke dudirê e. Heta ziman bigihîje asta mirinê dikeve nav astên dîtir. Wekî di bin xetereyê de, stabîl, brînbar, ewle û hwd. Ev ast ji aliyê hin zimannasan hatine senifandin, di berdewamiya vê beşê de dê behsa van senifandinan were kirin. Metoda vejandina zimên di nav vê pêvajoyê de derdikeve pêş. Rêbertiyê dike ku ziman negîhîjin encama mirinê.

Ziman çima dimirin? Ji bo vê pirsê gelek sedemên lêkolînê hene lê di vê derê de behsa çend heban dê bê kirin. Li gorî Açar, zimên bi demê dikare ji ber hin kiryarên civakî biguhere. Ev guherîn dibe ku bi zanetî yan jî ji ber sedemên nejidest pêk werin. (2022, r. 157) Li gor Unescoyê mirin û xeterbûna zimanan dibe ku ji ber hêzên derveyî be, yên wekî; bindestiya ol, aborî, çandî, artêş yan jî perwedeyê. Yan jî dibe ku ji ber hêzên hundirîn be, yên wekî; li hember zimanê xwe helwestên neyînî yên civakê. Gelemperî hêzên hundirîn çavkaniya xwe ji hêzên derveyî digirin û her du jî veguhastina çand û ziman ya di navbera nifşan de didin sekinandin (2003, r. 3-5).

Crystal ji bo mirina zimanan du cure faktorên destnîşan dike; ya yekem faktorên ku mirovan dixin bin xetereya fîzîkî. Ev faktor ji bûyerên ku bi awayekî fîzîkî pêk tên,

zimanên ku axiverên wî kêman in û ew axiver li cihên dûr dijîn dibe ku zererê ji erdhej, lehî, tsunamî, şer, komkuji û hwd. bibin. Ev bûyer zererê didin mirovan ku ew kes axiverê zimanekî ne, bi vî awayî ziman jî digel mirovan dikeve bin xetereyê (Crytsal, 2003, r. 71-72). Ya duyem faktorên ku çanda mirovan diguherînin. Ev faktor li ser têkiliya bihêz a zimên û çandê radiwestin. Faktorên ku çanda mirovan diguherînin dibin sedema xeterbûn an jî mirina zimanan. Di van faktorên de mirovên ku xwediyê zimanekî ne hêj dijîn lê zimanê wan mirî ye. Ji vî yekî re asîmîlasyonê çandî tê gotin; çandek dikeve bin bandora çandeka serdesttir. Di encamê de endamên wê çandê adapteyî wê çanda serdest dibin, çanda wan bixwe êdî karaktera xwe wenda dike. Ev rewş bi çend rêyan pêk tê; wekî mînak rêyek jî kolonyalîzm e. Ji bo vê mînakên klasîk Awistraliya û Emerîka ne (Crytsal, 2003, r. 76).

Li gorî Mark Janse, faktorên ku mirina zimanan nîşan didin gelemperî lîngûîstîkî nînin. Faktorên herî berbelav faktorên sosyoekonomîk û sosyopolîtîk in. Faktorên sosyoekonomîk wekî; kêmbûna derfetên aborî, guherînen mezîna aboriyê, pêşveçûna pîşesaziyê, koçberî û wd. Faktorên sosyopolîtîk wekî; polîtîkayên fermî yê zimên, cihêkarî, şer û hwd. Polîtîkayên fermî yê zimên li ser mirina zimanan dikare bibe sedemeka teqez û wisa bûye jî. Têgeheka ku ji bo vê rewşê tê bikaranîn “glotophagie” ye yanê “cihêkariya zimên” e. Têgeheka din ya gelek caran ji bo vê rewşê tê bikaranîn “linguicide” ye yanê “komkujiya zimên” e (2003, X). Nexwe li gorî gotina Janse mirina zimanan problemeke sosyopolîtîk, sosyoekonomîk û di dawiyê de jî sosyolîngûîstîk e. Ji ber ku li ser rewşa zimên polîtîka û aboriya serdemê ku axiver tê de ne ji lîngûîstîkê bi bandortir in.

Eger bi mînakekê ev rewş were zelalkirin, di sedsala 19em de li Amerîkayê polîtîkaya “tenê îngîlîzî” hebû û ev polîtîka ji bo ku xelkê Amerîkayê mecbûrî îngîlîzî hîn bibin hatibû dîzaynkirin. Gelek mînakên din yê modern jî vê rewşê piştrast dikin. Wekî mînak zimanê kurdî li Tirkîyeyê, arnavutî li Kosovayê, ermenkî li Yunanîstanê. Statû û sînorên zimanan dibe ku li gor qanûnên welatan biguhere. Wekî mînak zimanê katalanî û baskî li Îspanyayê xwediyê akademyên fermî yê zimên in lê li Fransayê nînin. Herçiqas cihêkariya zimên û komkujiya zimên mirina zimanan zêde dike, di heman demê de ji bo axiverên zimanên kêmpar û di bin xetereyê de dibe sedema hişyarbûna hestên nasnameyê (Janse, 2003, X). Wekî ji van mînan jî tê sedemeka lîngûîstîkî nayê dîtîn. Tê fêhmîkirin mirina zimanan bûyereke bi rewşa civatê ve girêdayî ye. Rewşa civatê ya aborî û polîtîk ve. Ji ber ku parastin û pêşveçûna zimanan li gor derfetên wê civatê pêk tên, ev derfet jî girêdayiyê başbûna aborî û polîtîkayên mafparêz in.

2.1. Senifandinên Xetereya Zimanan

Her ziman di nav civak û miletekî cuda de teşe digire û li gor şert û mercên serdemê wan guherbar dibe. Lewra wextê hinek ziman di bin xetereyê de ne hinek dibe ku li ber bi mirinê bin. Ji ber vê cîyawaziyê zimannas hewcehî pê dîtine ku senifandinên li ser astên xeterbûna zimanan bikin. Li ser senifandina astên xetereya zimanan ge-

lek senifandinên curbicur ku li ser faktorên curbicur hatine kirin. Dê li vê derê behsa çend hebên navdar bê kirin.

2.1.1. Senifandina Unescoyê

Zimanên mirî: Qet axiverên wî zimanî nemane, û çavkaniyên berdest yê doku-mantasyonê jî tûne ne. Westê wiha bibe ew ziman nikarin ti caran werin xilaskirin.

Zimanên bi awayekî cidî di bin xetereyê de: Axiverên herî ciwan dapîr û bapîr in û ew jî zimên qismî û kêr caran xeber didin. Ev cure zimên nişan dide ku vegu-hestina di navbera nişan de pêk nehate û ji ber ku axiverên herî ciwan dapîr û bapîr in dê ji vir şunda jî veguhestin pêk neyê. Ev cure ziman bi temenmezinan tê sînordarkirin.

Zimanên bi awayekî giran di bin xetereyê de: Ziman ji aliyê dapîr û bapîran ve tê xebirdan, dê û bav dibe ku jê fahm bikin lê çî bi zarokên xwe re çî jî di nav xwe de wî zimanî xeber nadin. Di vê derê de ziman sînordarkirî dimîne, ji ber ku herçiqas dê û bav ji zimanê xwe fam dikin wê bi kar neynin û veneguhezî zarokên xwe jî.

Zimanên teqez di bin xetereyê de: Zarok êdî wekî zimanê dayikê zimanê du-yem li malê hîn dibin. Digel ku zarok berîya ku biçin dibistanê dikarin zimanê xwe yê zikmakî hîn bibin, dê û bav êdî hewcehî vê yeke jî nabînin û bi helwesta ku hewcehî êdî bi wî zimanî tûne ye û dê serê zarokan bi du zimanan tevlihev bibe û hwd. Zarok wekî yekzimanî mezin dibin û ev ziman jî zimanê wan yê zikmakî nîne.

Zimanên birînbar: Gelek zarok bi zimanê xwe xeber didin lê dibe ku ev bi hin cihan sînordar be, wekî; li malê. Zarok berê ku dest bi dibistanê bikin ji dê û bavên xwe zimanê xwe yê zikmakî hîn dibin. Bi destpêkirina dibistanê zimanekî nû hîn dibin û tevî lêteratura xwe dikin. Ev zarok westê tî malê yanî bi gotineke din der-veyê dibistanê dîsa vedigerin ser zimanê xwe yê dayikê. Lê ji ber ku perwerde, karên fermî û hwd. bi zimanê zikmakî nayên pêkanîn û ev ziman nikare bikeve wan qadan lewra birînbar e. Zimanên ku di vê astê de ne mimkûn e ku derbasê astekê din bibin. Xirabtir jî dibe baştir jî dibe ev yek girêdayî guherînan e.

Zimanên ewle: Ziman ji aliyê hemû nişan ve tê xebirdan û veguhastina di nav-bera nişan de bênavber e. Ev cure ziman zimanên xwedî statuyên baş in, di her qadê de tî bikaranîn (UNESCO, 2010, r. 11-12).

2.1.2. Senifandina Kraussî

Micheal Krauss (1934-2019) zimannasekî emerîkî ye. Li Zanîngeha Chicago û Colombiyê lîsans û mastir û li Zanîngeha Harwardê jî xwendina xwe ya doktorayê temam kiriye. Krauss li ser rasteqîniya xeterbûna zimên rawestiyaye û xebatên xwe li ser vê helwestê domandiye. Ew xwediyê “Navenda Zimanê Xwecih a Alaskayê” ye ku li Zanîngeha Fairbanksê ava kiriye û bal kişandiye ser zimanên Alaskayê yê di bin xetereyê de (Smith, 2019).

Zimanên di ewlehiyê de: Ev cure ziman wekî zimanê dayikê tê hînkirin û ne tenê ji ber vê heman demê em wisa texmîn dikin ku wê di paşeroja berdîtî de jî bê hînkirin.

Zimanên di bin xetereyê de: Zimanên di bin xetereyê de di nav xwe de ji çend astan pêk tên. Xeterbûna zimên bûyereke demdirêj e.

A. Zimanên stabil: Zarok vî zimanî wekî zimanê dayikê hîn dibin. Zarok wextê dest bi dibistanê bike dê zimanekî nû hîn bibe û ew ziman êdî dê bibe zimanê wî yê perwerdeyê û yê kar jî. Ji ber vê yekê ziman di vê astê de stabil û biguman e.

B. Zimanên lawaz: Ev ziman ji aliyê kesên temenmezin ve tê xeberdan û ji nifşa ciwan re nayê veguhestin.

C. Zimanên guherbar/bêbinyad: Hinek zarok wî zimanî bi kar tînin.

D. Zimanên ku teqez di bin xetereyê de ne: Ziman bendava herî giring derbas kiriye, ziman êdî wekî zimanê dayikê ji zarokan re nayê hînkirin û axiverên herî ciwan ji nifşa dê û bav in.

E. Bi awayekî giran di bin xetereyê de: Nifşa axiver a herî ciwan ji nifşa dapîr û bapîr in, û dê û bav nikarin zimên hînî zarokên xwe bikin.

F. Bi awayekî cidî di bin xetereyê de: Axiverên herî ciwan ji nifşa mezin dapîr û bapîr in û ew gelek kêma in.

Zimanên mirî: Êdî qet axiverên wî zimanî nemane û ne mimkun e ku dokumentasyonên nû werin bidestxistin (Krauss, 2007, r. 2-6). Di metoda vejandina zimanan de diyarkirina rewşa zimên gava ewil a herî giring e, ji ber ku rewşa her zimanî ji hev cuda ye. Wextê pêşî rewşa zimên û senifandina ku ew tê de cih digire were diyarkirin xebat û hewildanên ji bo vejandina zimên jî li gor wî tên pêkanîn. Ji ber hindê zanîna asta xetereya zimên di metoda vejandina zimanan de cih digire û ji bo xebatên ser vejandina zimanan giring e.

3. Plansaziyên Vejandina Zimanan

Têgeha pilansaziya zimên ji aliyê zimanzanê emerîkî Einar Haugen ve di dawiya salên 1950yî de hatiye danasîn, ji bo hemî hewlên hişmendî tê bikaranîn ku armanca wan guherandina reftara zimên a civateke zimanî ye (Önen, 2018, r. 36). Armanca plansaziyên vejandina zimên jî wekî plansaziya zimên guherandina reftara zimên e, plansaziya vejîna wî ye. Vejîna ji xeterbûnê yan jî vejîna ji ber mirinê. Plansaziyên vejandina zimanan du cure ne. Ya yekem Plansaziya Standardîzasyonê ye, ya duyem Plansaziya Zimên a bi Civatê Binyatkirî ye. Plansaziya Standardîzasyonê Zimên ji sê beşan pêk tê ku ew jî wekî plansaziya statuyê, corpusê û bidestxistinê hatiye dabeşkirin.

3.1. Plansaziya Standardîzasyonê

3.1.1. Plansaziya corpusê

Ev plansazî plansaziya ji bo ziman, armanc û qadên diyar e. Plansaziya statuyê vê pirsê dike “Ziman dê ji bo çi were bikaranîn?” plansaziya statuyê biryar dide ka li cihên kar, medya, doz û dibistanan de kîjan ziman dê bê bikaranîn.

3.1.2. Plansaziya corpusê

Ev plansazî li ser biryara bikaranîna awayê zimên disekine. Pirsra ku corpus dike ev e, “Kîjan form dê baştir xizmeta fonksiyonên zimên bike?” pêşxistina sîstemên nivîsandin, gramer, peyvên nû û materyalên hînkirina zimên mînakên plansaziya corpusê ne.

3.1.3. Plansaziya bidestxistinê

Biryar dide ka dê kî û çawa plansaziya zimên pêk bîne. Pirsra ku dike ev e, “Divê axiverên zimên xwedî kîjan qabîliyetan bin ji bo rast bikaranîna fonksiyonên zimên?”. Amadehiya mamosteyên zimên û plankirina perwerdeyê mînakên vê plansaziyê ne. Ev her sê plansazî ji hev cuda nînin, bi hev re ne û di nav sîstemên ku ji aliyê politîka, civakî û aboriyê de berfireh in pêk tên (McCarty, 2018, r. 23). Plansaziyeke din a vejandina zimên, Plansaziya Vejandina Zimên a bi Civatê Binyatkirî ye. Jousha Fishman jî di pirtûka xwe ya bi navê *Do Not Leave Your Language Alone* de li ser plansaziya zimên disekine, li gor Fishman du aliyên plansaziya zimên hene: plansaziya statûya zimên û ya din jî plansaziya korpus e. Di heman demê de plansaziya zimên bi politîkayên zimanî ve jî pêwendîdar e. Li gor Fishman herçend ev têgeh, têgehên modern bin jî û plansaziya zimên bi awayekî veşartî be jî di serdemên kevnare de hene (Filiz, 2017, r. 129).

3.2. Plansaziya Zimên ya Bi Civatê Binyatkirî

Ev plansaziya bi civatê binyatkirî wekî ji navê wê jî tê fahmkirin piştî xwe pal nade piştgiriya dewlet û fermîbûnê, pal dide civatê. Ji aliyê komekê ve yan jî ji aliyê ferdekî ve jî dikare dest pê bike. Mirov dikare wekî plansaziya zimên ya ferdan û komên vejandina zimên binirxîne.

Ev plansazî ji jêr ber bi jor e, ji jor ber bi jêr nîne. Yanê bi gavên piçûk yê bingehîn ber bi gavên mezintir û bi vî awayî ber bi encamên bikêr diçe. Li gor hewcehî û daxwazên herêmê û çavkaniyên berdest ên xwecihî û li gor derfetên demê teşe digire. Wekî mînak, ji ber ku dibistanên bajaran perwerdeya zimanê dayikê nadin û zarok jî diçin van dibistanan, serokên eşîran komekê ava dikin. Komekê ku ji personelên xwecihî pêk tê û dê zimanê dayikê hîn bike (McCarty, 2018, r. 23). Wekî bi vê mînakê jî tê dîtin ev plansazî ji aliyê endamên civakê tê pêkanîn. Ji bo pêkanîna vê plansaziya destûr yan jî piştgiriya dewletê hewce nake. Ev plansazî ji aliyê komên xwecihî ve tê destpêkirin. Divê vejandina zimên di nav koma xwecihî de rasterast ji jêr ber bi jor û ji hundir bo derve be (McCarty, 2018, r. 31). Li vir qest ev e ku xebatên di vê plansaziyê de pêşî li hundir yanî pêşî ji ferdên di nav wê civatê de ne dest pê dike û paşê ev xebat bo derve tînin veguhestin û domandin. Di destpêkê de plansaziyeke takekesî û paşê jî kolektîf e. Piştî ku hişmendiya zimên di nav civatê te pêk tê, lêgerînên ji bo çareseriyê dest pê dikin.

Ji bo vê plansaziyê formulek yan jî vîzyoneka gihiştina biserketîna de tenê rêyek tune ye, gelek rêyên gihiştina biserketîna hene. Plansaziya zimên ya bi civatê

binyatkirî, helwesteke ku “li gor her kesî” ye. Wekî plankerê zimanê mîamiyê Darly Baldwin not dike, “Di vê plansaziyê de ne muhîm e ku rêyeka dîyar a avakirinê hebe, ya muhîm ew e ku ji hemû rêyên heyî sûd were girtin” (McCarty, 2018, r. 31). Ev plansazî ji zêdebariyên re vekirî ye.

Plansaziya zimên plansaziya civatê ye. Ev plansazî holîstîk û sistematîk e. Divê lêkolîn bike ka ziman bi kîjan mijaran di jiyana civatê de li ku derê çawa tê bikaranîn (McCarty, 2018, r. 32). Ev plansazî hewcehî pê dibîne ku nêrîneka dîrêj a pêvajoya vejandina zimên hebe. Loma dixwazîn wêneyekî mezin ê plansaziyê hebe. Ji ber ku difikirin ku xebatên çawa hem ji bo vê nîfşê hem ji bo nîfşên paşerojê dê bibin alîkar (McCarty, 2018, r. 32).

Li gor Stefan Winter, pirsgirekên zimanan hertim pirsgirekên mirovan in (1999, r. 89). Loma divê di navenda vê plansaziyê de civat û mirov cih bigirin ne tenê ziman. Xebatên bi vê plansaziyê hewl dide bide zanîn ku pirsgirekên ziman pirsgirekên mirovan in û bi vî awayî çareserkirina hin pirsgirekan jî di destê civat û mirovan de ye. Lewra dixwaze hişmendiya zimên li ser pirsgirekên civat û mirovan bide zanîn û belav bike.

Gavên ku divê ji bo projeyekê serkeftî ya vejandina zimên bînin avêtin ji şeş gavan pêk tê, guhdayîna van gavan xebatên vejandina zimên nêzî encamên bikêr dike (Penfield, 2021, r. 64-69).

Gava 1. Destpêka her projeyeka baş bi fikreka baş dest pê dike. Ev fikr li gor çavkanî û kapasîteya koma vejandina zimên teşe digire. Biryara fikreka bi vî awayî di nav komê de ji aliyê beşdaran ve tê şewirîn. Di vê gavê de pirsên wiha dikarin bibin alîkar; ‘Em dikarin çî bikin ku alikariya armancên me yê nîha yê berdest bike?’ yan jî ‘Çalakiyên ku hûn dixwazîn bidome kîjan in?’. Bi vî awayî dibe ku zelal bibe ka kom bizane ji bo wan ya giring çî ye? Ew dixwazîn zimanê xwe di nav pêvajoyeka çawa de bibînin? Wê demê dê çalakiyên baldartir li dora van berjewendiyan bînin avakirin.

Gava 2. Binêrin ka çî hatiye pêkanîn û hewcehî bi çî heye? Eger wek paşxaneyê zimên û hewcehiyên zimên û armancên komê werin diyarkirin wê gavê dê gavên ji bo çalakiyan jî bêtir di cî de bin. Wekî mînak; ji bo berdehamiya vejandina zimanê xwe hewcehiya me bi avakirina hêlîna/corpusa zimên heye (wekî mînak ferhengê online, polên zimên di dibistanan de û hwd.).

Gava 3. Pêkanîna fikrê. Fikrek heta ku bi forma projeyeka giring rasteqîn bibe û encamên berbiçav bide wek kurteyekê ye.

Gava 4. Nivîsandina puxtêya projeyê. Bi paragrefeka kurt danasîna projeyê bike, divê ev paragraf zelal, sade be û divê bi îfadeyekê wekî ‘armanca vê xebatê...’ dest pê bike.

Pêdiviyên ku proje li ser disekine nîşan bide. Ev pêdivî dibe ku yek û ji yekê zehf-tir jî bibe. Hewcehî bi awayekî berfireh jî dikare bê dayîn (wekî hewcehî bi vejandina zimanê me heye) bi awayekî spesîfîktir jî (hewcehiya zimanê me bi pêşvebirina materyalên dersên vejandina zimên heye) dikare bê nîşandan. Herî dawî jî divê sedem û giringiya van pêdiviyan werin diyarkirin.

Girseya ku dê proje muxatabê wan bibe bifikiran. Bi vî awayî gav dê li gor wan bîn avêtin. Herî kê 3 encamên zelal ku dê proje pêk bîne diyar bikin, eger di rêwitiyekê de fikra ku hûn ber bi ku ve diçin hebe ev wê hêsantir dike. Diyarkirina encaman çend tiştan pêk tîne; Ji bo plansaziya biserketinê alîkarî dike, alîkariya birêvebirina projeyê dike (ne şert e ku gelek encam hebin), di warê armancên civatê ya ji bo vejîne mirovan li ser nirxên vê projeyê agahdar dike, ji bo nirxandina projeyê avahiya ku hewce ye pêk tîne. Lîsteya gavên ji bo bidestxistina van encaman amade bike. Wextê tu di destpêka projeyê de yî lîstekirin rêbazeka alîkar e. Bifikire ku hewcehiya te bi çi çavkaniyan heye. Bifikire ku çavkaniya te ya aborî çi ye? Ji ber ku wexta tu vê projeyê pêk bînî wekî mînak, ji bo tomarkirinê rêwitî dê pêk werin ji bo wan divê çavkaniya aborî diyar û amade be. Demnameyeke zelal ku destpêk û dawî diyar in divê were amadekirin.

Gava 5. Projeya xwe pêk bîne. Dibe ku her tişt wekî ku hatiye plankirin neçe lewra divê tu di vê mijarê de nerm bibî, guherînan bikarî çêbikî û zehmetiyên ku çêdibin bişopî.

Gava 6. Plana xwe çêbike ka tu dê projeya xwe çawa binirxî? Bipirse ka hûn dê kîjan stratejiyên nirxandinê bi kar bînin. Ev nirxandin dikare fermî jî bibe nefermî jî bibe. Gelemperî nirxandineka fermî ji aliyê kesekê ku eleqeya wî bi projeya hatî çêkirin tune ye tê xwestin ji bo ku bi çavekî objektîf projeyê binirxîne û nirxandineka ji derve pêk were. Ev kes dibe ku yekî ji projeyeka nêzikê projeya we be yan jî kesekî ku ji aliyê projeyên zimên ve profesyonel be. Nirxandinên fermî carin bi mesref e lewra dibe ku ji bo carekê di dawiya projeyê de were kirin. Ji bo armancên komên vejandinê nirxandinên nefermî hertim giring in. Ev nirxandin ji aliyê rêvebirên komê yan jî ji aliyê endamên komê ve tîne pêkanîn. Nirxandinên nefermî dikarin di her qonaxa projeyê de werin pêkanîn, nirxandinên nefermî nirxandinên fermî hebe jî tune be jî divê werin pêkanîn. Hewce ye koma vejandina zimên di nav xwe de nirxandinên xwe bikin da ku kêmasî û hewcehiyên projeya xwe bibînin. Divê neyê jibîrkin ku vejandina zimên tenê gaveka pêş e ku hebûna wî zimanî demeka dirêj bidome. Bifikirin ka projeya we çi zêdebarî li vê gavê dike û xebatên we dê ji bo projeyên dahatûyê yê vejandina zimên çiqas bikêr bibe.

Ev gavên diyarkirî yê ji bo projeyên vejandina zimên wekî rêberekê projeyên ji bo vejandina zimên kar dikin. Di vê derê de armanca metodê ev e ku vejandina zimên çiqas ji dest were bi awayekî holîstîk û sistematîk were pêkanîn û bi avêtina van gavan proje bigihîje encamên bikêr. Digel ku ev gav hatine diyarkirin dîsa jî ferd yan jî komên vejandina zimên dikarin ji bo proje û xebatên xwe gavên dîtir jî lê zêde bikin û li gor xwe biguherînin.

Ji bo projeyeka vejandina zimên hebûna plansaziyeke stratejîk a berfireh, zêdebarîyeke mezin e ji bo vîzyona domdarîya zimên. Heman demê planên bi dîqet yê projeyên ferdî jî giring in (Penfield, 2021, r. 62). Ne şert e ku hewildan û xebatên ji bo vejandina zimanan hertim bi awayekî kolektîf werin pêkanîn, bi awayekî ferdî jî di-

karin werin pêkanîn. Jixwe di dawiyê de ji her kesî tê xwestin ku bi hişmendiya xwe ya zimên ya nû, bila her kes bibe komîserê zimanê xwe û xwedî lê derkeve. Projeyên ferdî bo ku baştirîn armancên demdirêj pêk bînin dikarin werin pêkanîn. Li gorî Penfieldî ji bo projeyên ferdî yê vejandina zimên çend aktîvîteyên mînak (2021, r. 63);

Stranên ku bi zimanê min in qeyd bikim, Ev aktîvîteya ferdî li her derê li gor derfetên berdest yan bi qeydkirina dengên yan jî bi dokumantasyona gotinên stranên dikare were pêkanîn. Sitranên miletekê di nav xwe de hêmanên çandî û dîrokî di-hewînîn û bi zimanê dayikê tîne vegotin ji ber hindê ew ji bo armancên pêşerojê yê zimên yanê ji bo vejandina zimên kêrhatî ne. Herweha; ji bo zimanê xwe sîstemeka nivsandinê pêk bînim, ji bo zimanê xwe hewldanên xwendin û nivîsandinê zêde bikim; Li vir qesta aktîvîteyê ew e ku xebatên ji bo teşwîqkirina hînbûna zimên werin kirin. Eger ev bi awayekî ferdî were kirin mirov dikare bibêje her ferdî dikare di nav civata xwe de vê hişmendiya belav bike. Aktîvîteyeka din, ji bo zimanê xwe sepanekê ava bikim; Eger derfet hebe ev sepan dikare bibe sepana çîrok, hînbûna ziman, peyv û hwd. Ev aktîvîteya ferdî dîsa li gor ferdê dilxwaz û derfetên berdest teşe digire. Dîsa li gorî Penfield avakirina ferhengê online aktîvîteyeka din a ferdî ye. Di serdema teknolojiyê û medyaya civakî de sazkirina sepanên bi vî şiklî ji bo aktîvîteyên vejandina zimên mînakek e û ev cure mînak dikarin werin zêdekirin. Wekî avakirina sepanên lîstîkê yê bi zimanê xwe, sepanên hînbûna peyvên û her wekî din.

Digel van behsa çend aktîvîteyên din jî dike; zimanê xwe hîn bikim, beşdarbûna ciwanan ya ji bo xebatên zimên zêde bikim, derbarê zimanên xwecihî hişmendiya gel zêde bikim (Penfield, 2021, r. 63). Her kesê ku derfet bibîne dikare hewil bide ku zimên hînê kesên li der û dora xwe bike. Ji ber ku li vir kîtle ciwan in ev xebata ferdî divê li kodên wan were ku ew bi vê xebatê motîve bibin û beşdarbûn zêde bibe. Wekî mînak; ji ciwanan bê xwestin ku ji mezinên xwe berhevkariya gotin, zûgotinok, çîrok û hwd. bikin. ku mirov ji bo kurmancî vê yekî bifikire xebatên Resul Geyikî yê bi navê Hînkirina Zimanê Kurdî wekî Zimanê Yekem (Ewil) û Teorîya Hînkirina Kurdî-Kurmancî û gelek çavkanîyên din ên di vê qadê de dikarin rêbertîyê li vê aktîvîteyê bikin.

Ev aktîvîteyên ferdî hem ji aliyê kesên ku di nav civata xwe de xwedî statûyê ne dikarin bêne pêkanîn. Da ku civat guh bide wan kesan û bibin xwedî hişmendî. Hem jî bi rêya pirtûk, medya û wd. dikarin pêk bên. Ev hin fikrên derbarê aktivîteyên projeya vejandina zimên bûn. Aktivîte li gor rewş û hewcehiya civateka dîyar tîne destnîşankirin. Projeyên dîtir dikarin zehftir aktîvîteyan di nav xwe de bihewînin. Ev yek li gor hewcehî û rewşa wî zimanê pêk tê.

Encam

Ev gotar xebat û lêkolînên di derbarê vejandina zimanan de diguhêze. Li ser metoda vejandina zimanan û giringiya parastina zimanên ku di bin xetereyê de ne, danasîneka berfireh dike. Gotar di destpêkê de têgeha “vejandina zimanan” û sedemên ku ev pêvajoyê çêdibe, vedibêje. Armancên vejandina zimanan, motîvasyonên

vejîneran, û îdeolojiyên ku di vê pêvajoyê de rolên sereke dilîzin, destnîşan dike. Her weha, gotar behsa mirina zimanan dike digel pênase sedemên wî, û senifandinên cihêreng ên li ser astên xetereya zimanan jî nîşan dide ku ji alîyê Unescoyê û ji alîyê hin zimannasan ve li gor hin pîvanan hatine senifandin. Plansaziyên vejandina zimanan destnîşan dike û gavên ji bo pêkanîna projeyên vejandina zimanan nîşan dide. Plansazîya standardizasyona zimên pêşkeş dike û plansazîyeke din a bi navê plansazîya bi civatê binyatkirî nîşan dide ku ev plansazî bi metoda vejandina zimên derdikeve pêş. Bi plansazîya bi civatê binyatkirî nêrîneke nû tîne xebatên zimên ku ji bo xebatên parastina zimên ferd û civat bixwe bêyî piştgirîya fermîyetê dikarin bibin vejînerê zimanê xwe û zimanê xwe bigihînin astekê. Ev modela ku ji alîyê zimannas Leanne Hinton û Lenore Grenoble hatiye avakirin zêdebarîyê li aktîvîteyên vejandina zimanan dike. Rewşa ku niha kurdî di tê de ye hewcehîya zazakî bêtir bi vejandina zimên heye û xebatên ji bo zazakî kêr in. Encama ku ev xebat dixwaze bigihîje ew e ku ev metod ji bo aktîvîst û vejînerên zazakî bibe modelek û ji bo kurmancî jî bibe pêşxistina zimên, û zêdekirina helwestên erênî û axiverên nû. Ev metod dixwaze hişmendîyeke nû ya zimên belav bike ku ji bo domdarîya zimên bi kêr e. Vejandina zimanan tenê ji bo parastina zimanan nîne, heman demê ji bo parastina çand, mîrat û nasnameya civatan jî giring e.

Extended Abstract

This article delves into the methodology of language revitalization, a critical process aimed at revitalizing endangered or extinct languages. The study is based on the thesis titled “The Method of Language Revitalization: An Example from the Hawar Journal,” which explores the theoretical and practical aspects of language revitalization through the lens of the Hawar Journal, a significant publication in the context of Kurdish language revitalization. The article provides a comprehensive overview of the language revitalization process, emphasizing its importance in preserving cultural identity, collective memory, and human rights.

Language revitalization is defined as the process of bringing a language back to active use, particularly in communities where it has been marginalized or is at risk of extinction. This process is not merely about expanding the linguistic system but also about reintroducing the language into new domains and among new speakers. The article highlights the multifaceted nature of language revitalization, which involves political, ideological, and motivational factors. It is a global movement deeply tied to human efforts and is often seen as a response to historical oppression and forced assimilation. Language revitalization is particularly crucial for the thousands of languages currently at risk of extinction, as their loss would also mean the disappearance of associated cultures, knowledge systems, and identities.

The article identifies several key motivations for language revitalization, including the desire to reconnect with cultural heritage, resist colonial legacies, and promote mental and physical well-being. Studies have shown that speaking one’s native language can enhance psychological resilience, reduce suicide rates, and improve overall health outcomes. Additionally, language revitalization is often linked to broader social movements, such as decolonization and the fight for linguistic and cultural rights. The article also discusses the ideological underpinnings of language revitalization, emphasizing the need for a supportive community stance and the role of standardizing or preserving linguistic diversity.

A significant portion of the article is dedicated to the phenomenon of language death, which occurs when a language loses its last native speaker. The article cites UNESCO’s classification of endangered languages, ranging from “vulnerable” to “extinct,” and discusses the socio-political and economic factors contributing to language endangerment. These include globalization, colonization, and policies that favor dominant languages over minority ones. The article also explores the stages of language endangerment and the challenges faced in reversing this process.

The article outlines various strategies for language revitalization, including status planning, corpus planning, and acquisition planning. The article emphasizes the importance of community-based planning, where local initiatives play a central role in the revitalization process. These grassroots efforts are often more sustainable and effective than top-down policies imposed by governments.

The article concludes by stressing the holistic and systematic nature of language revitalization. It is not merely a linguistic endeavor but a social movement that requires the active participation of communities, policymakers, and linguists. The revitalization of a language is intrinsically linked to the revitalization of its associated culture, making it a vital component of preserving human diversity and heritage. The article underscores the urgency of language revitalization efforts, given the rapid rate at which languages are disappearing worldwide. In summary, this article provides a detailed exploration of the methodology of language revitalization drawing on the example of the Hawar Journal to illustrate the practical application of these principles. It highlights the cultural, social, and political dimensions of language revitalization and emphasizes the need for coordinated efforts to ensure the survival of endangered languages. The article is a valuable resource for linguists, policymakers, and communities engaged in the vital work of language preservation and revitalization.

Çavkanî / References

Açar, Z. (2022). *Sosyolînguîstîk, Hin Têgehên Serekî û Sehayên Xebatê yên Vê Zanistê. Rêzegotarên Zimannasiya Kurdî-Destpêk û Têgehên Sereke*. Peywend Yayınları.

ANU Press (b.t.) Patrick McConvell. <https://press.anu.edu.au/publications/authorshorseditors/patrick-mcconvell>

ANU Press (b.t.) Wurm. Stephen Adolphe. <https://archivescollection.anu.edu.au/index.php/wurm-stephen>

Crystal, D. (2003). *Language Death*. Australia: Cambridge University Press.

Dolowy- Rybinska, N. Hornsby, M. (2021) "Attitudes and Ideologies in Language Revitalisation" (ed. Julia Sallabnak etc.) *Revitalizing Endanegered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

Filiz, M.Ş. (2017) "Sosyolînguîstîk û Jousha A. Fishman" (ed. Kenan Subaşı, Resul Geyik) *Gotarên Zimannasiyê*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Find A Grave (2004, Dec. 24). Marvin Dale Kinkade. Findagrave. <https://www.findagrave.com/memorial/28555758/marvin-dale-kinkade>

Geyik, R. (2016). *Hînkirina Kurdî Wekî Zimanê Yekem (Ewil)*. Teza Lisansa Bilind. Wan: ZYY. Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Geyik, R. (2020). *Teorîya Hînkirina Kurdî-Kurmancî*. Ankara: Weşanxaneya Azad.

Grenoble, L. A. (2021) "Why Revitalize?" (ed. Julia Sallabnak etc.). *Revitalizing Endanegered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

Hinton, L. (2013) "Language Revitalization: An Overview" (ed. Leanne Hinton, Ken Hale). *The Green Book of Language Revitalization in Practice*. California: Brill Press.

J. Majerska-Szajnajer, (2021) "Language Revitalization Benefits in Wilamowice" (ed. Julia Sallabnak etc.). *Revitalizing Endanegered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

Janse, M. (2003) "Introduction: Language death and language maintenance: Problems and prospects" (ed. Sijmen Tol and Mark Janse). *Language Death and Language Maintenance Theoretical, Practical and Descriptive Approaches*. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company.

Krauss, M. (2007). "Classification and Terminology for Degrees of Language Endanegerment" (ed. Matthias Brenzineger). *Language Diversity Endanegered*. Berlin: Mouton de Gruyter Press.

Maryniak, J. Majerska-Szajnajer, J. Krol, T. (2021) "Ethical Aspects and Cultural Sensitivity in Language Revitalization" (ed. Julia Sallabnak etc.). *Revitalizing Endanegered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

McCarty, T. L. 2018. "Community-Based Language Planning Perspectives from In-

digenous Language Revitalization” (ed. Leanna Hinton etc.). *The Routledge Handbook of Language Revitalization*. New York: Taylor & Français Press.

Penfield, S. D. (2021) “Planning a Language Revitalization Project” (ed. Julia Sallabnak etc.). *Revitalizing Endangered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

Prabook (b.t.) Tasaku Tsunada linguistics professor

Sallabank, J. King, J.(2021) “What Do We Revitalize?” (ed. Julia Sallabnak etc.). *Revitalizing Endangered Languages A Practical Guide*. United Kingdom: Cambridge University Press.

Skutnabb-Kangas, T. (2018). “Language Rights and Revitalization”. (ed. Leanna Hinton etc.). *The Routledge Handbook of Language Revitalization*. New York: Taylor & Français Press.

Smith, Z. (2019, Oct. 13). A linguist who fought for the languages he studied. *The-cordovatimes*. <https://www.thecordovatimes.com/2019/10/13/a-linguistwho-fought-for-the-languages-he-studied/>

Spence, J. (2018) “Learning Languages Through Archives” (ed. Leanna Hinton etc.). *The Routledge Handbook of Language Revitalization*. New York: Taylor & Français Press.

Splosky, B. (1996) “Conditions for Language Revitalization: A Comparison of the Cases of Hebrew and Maori” (ed. Sue Wright). *Language and the State Revitalization and Revival in Israel and Eire*. Great Britain: Multilingual Matters Press.

Swadesh, M. (1948) “Sociologic notes on obsolescent languages”. *International Journal of American Linguistics*.

Tsunada, T. (2005). *Language Endangerment and Language Revitalization*. BerlinNewyork: Mouton de Gruyter Press.

UNESCO (2003, March 10-12). Document submitted to the International Expert Meeting on UNESCO Programme Safeguarding of Endangered Languages Paris <https://ich.unesco.org/doc/src/00120-EN.pdf>

UNESCO. (2010). *Atlas of the World’s Languages in Daneger 2010/3*. France Hornberegger, N. and Baker C. (2001) *Language Revitalization Processes and Prospects*. Canada: Kendall A. King.

Woolard, K. (2005). *Language and Identity Choice in Catalonia: The Interplay of Contrasting Ideologies of Linguistic Authority*. UC San Diego: Institute for International, Comparative, and Area Studies. Retrieved from: <https://escholarship.org/uc/item/47n938cp>